**EM JI BO DÎMOKRASÎYÊ**
SOZA BOCHUMÊ

Em dizanin em ji ku ne. Eslê me kesayetîya me dirustkirîye. Û em dizanin, ku em dixwazin herin kuderê: Tiştê herî girîng, paşeroja me ya hevbeş e. Dîmokrasî sozek e, ku me bi rêya destûrê bingehîn ji xwe re daye. Ew bingeha me ye – duhî, îro û sibe.

Tiştê me digihîne hev: keramet e. Her kes bi xwedan keramet tê ser rûyê dinîyayê. Ew parastî ye.

Kesê/Kesa li Bochumê dijî, bi azadî dijî. Her kes, jin be yan mêr be xweşîyê li bajêrê me dibîne û jîyaneke li gorî bîr û bawerîyên xwe yên taybet birêvedibe.

Azadîya her kesekî/kesekê li wê derê bi dawî tê, li wê dera ku azadîya kesê/kesa din destpêdike. Anku ev tê wê wateyê ku 1 Azadî heye û 374 000 sînor hene. Ev sînor hemerengîya me didine xuyanîkirin. Û di vê hemerengîyê de hestekî dilsozîyê me digihîne hev û din. Me ew li binê erdê peydakirîye û em hêza xwe û geşbînîya xwe ji bo paşerojê ji wê dilsozîyê distînin. Bochum ew bajar e, ku hîn EM lê girîng e.

Em hemî coreyên tundrewîya sîyasî û dînî tewanbardikin. Em bi behwerîyeke rehkûr bi azadîyê bi hev re li dijî tundrewîyê radiwestin û em nahêlin ku ev tundrewî me ji hev dûr bike.

Soza ku em îro didine hev û din: em bê kîn tevdigerin û em hewldidin, ku çareserîyên hevbeş peyda bikin û rêzê li kerameta her takekesî/takekesê digirin.

Em, civaka bajarê Bochumê piştgrîîya nirxê dîmokrasîya xwe dikin.
Her gav û li her derê.